PÊLÊN RONDIKAN

Demê te hêlayim
Raxerê rêka min bû meynet
Rêka min tarî bû, ez tê de mendehoş bûm
Yawer û yarên min
Ax û dax û hesreta eşqa min bûn
Her şev bi wê awaza
Bi davên pirça te sazê dijenî
Çavên min ji rondika tijî dibûn
Wêneyê te xwe dida ber pêlên rondikan û şilî dibû
Rondikên xwînkirî delîl in
Bo kesanên bawer nekin bi eşqa me min digot:
Dêmê te şerî di gel hemû exteran dike Min di got:
Vîna min bo te hemû cîhanê disoje
Lê min nedizanî dilê min dê bite
Cesteyek bê lêdan û dê pirt pirt be Lê dûriya te
Şev û rojan ahenga barandina rondika bû
Pêlên xwe li dor min dihavêje
Te hêlam û kirme cesteyek bê ruh û giyan Û...
Rê li ber berze

Perwîn Muhsin